# KURDÎ 5

# Kurmancî

**NIVÎSKAR**

Prof. Dr. Kadri Yıldırım
Yrd. Doç. Dr. Abdurrahman Adak
Yrd. Doç. Dr. Hayrullah Acar
Öğr. Gör. Zülküf Ergün
Öğr. Gör. İbrahim Bingöl
Öğr. Gör. Ramazan Pertev



**EDİTÖR**
Prof. Dr. Kadri YILDIRIM

**PROGRAM GELİŞTİRME**
Yrd. Doç. Dr. Cevat YILDIRIM
Yrd. Doç. Dr. Akif AKTO

**REHBERLİK UZMANI**
Öğr. Gör. Ramazan PERTEV

**ÖLÇME DEĞERLENDİRME**
Yrd. Doç. Dr. Abdurrahman EKİNCİ



# İSTİKLÂL MARŞI

Korkma, sönmez bu şafaklarda yüzen al sancak;
Sönmeden yurdumun üstünde tüten en son ocak.
O benim milletimin yıldızıdır, parlayacak;
O benimdir, o benim milletimindir ancak.

Çatma, kurban olayım, çehreni ey nazlı hilâl!
Kahraman ırkıma bir gül! Ne bu şiddet, bu celâl?
Sana olmaz dökülen kanlarımız sonra helâl...
Hakkıdır, Hakk'a tapan, milletimin istiklâl!

Ben ezelden beridir hür yaşadım, hür yaşarım.
Hangi çılgın bana zincir vuracakmış? Şaşarım!
Kükremiş sel gibiyim, bendimi çiğner, aşarım.
Yırtarım dağları, enginlere sığmam, taşarım.

Garbın âfâkını sarmışsa çelik zırhlı duvar,
Benim iman dolu göğsüm gibi serhaddim var.
Ulusun, korkma! Nasıl böyle bir imanı boğar,
"Medeniyet!" dediğin tek dişi kalmış canavar?

Arkadaş! Yurduma alçakları uğratma, sakın.
Siper et gövdeni, dursun bu hayâsızca akın.
Doğacaktır sana va'dettiği günler Hakk'ın...
Kim bilir, belki yarın, belki yarından da yakın.

Bastığın yerleri "toprak!" diyerek geçme, tanı:
Düşün altındaki binlerce kefensiz yatanı.
Sen şehit oğlusun, incitme, yazıktır, atanı:
Verme, dünyaları alsan da, bu cennet vatanı.

Kim bu cennet vatanın uğruna olmaz ki fedâ?
Şühedâ fışkıracak toprağı sıksan, şühedâ!
Cânı, cânânı, bütün varımı alsın da Huda,
Etmesin tek vatanımdan beni dünyada cüdâ.

Ruhumun senden, İlâhi, şudur ancak emeli:
Değmesin mabedimin göğsüne nâmahrem eli.
Bu ezanlar-ki şahadetleri dinin temeli-
Ebedî yurdumun üstünde benim inlemeli.

O zaman vecd ile bin secde eder -varsa- taşım,
Her cerîhamdan, İlâhi, boşanıp kanlı yaşım,
Fışkırır ruh-ı mücerred gibi yerden na'şım;
O zaman yükselerek arşa değer belki başım.

Dalgalan sen de şafaklar gibi ey şanlı hilâl!
Olsun artık dökülen kanlarımın hepsi helâl.
Ebediyen sana yok, ırkıma yok izmihlâl:
Hakkıdır, hür yaşamış, bayrağımın hürriyet;
Hakkıdır, Hakk'a tapan, milletimin istiklâl!


Mehmet Âkif ERSOY

# ATATÜRK'ÜN GENÇLİĞE HİTABESİ

Ey Türk gençliği! Birinci vazifen, Türk istiklâlini, Türk cumhuriyetini, ilelebet, muhafaza ve müdafaa etmektir.

Mevcudiyetinin ve istikbalinin yegâne temeli budur. Bu temel, senin, en kıymetli hazinendir. İstikbalde dahi, seni, bu hazineden, mahrum etmek isteyecek, dahilî ve haricî, bedhahların olacaktır. Bir gün, istiklâl ve cumhuriyeti müdafaa mecburiyetine düşersen, vazifeye atılmak için, içinde bulunacağın vaziyetin imkân ve şeraitini düşünmeyeceksin! Bu imkân ve şerait, çok nâmüsait bir mahiyette tezahür edebilir. İstiklâl ve cumhuriyetine kastedecek düşmanlar, bütün dünyada emsali görülmemiş bir galibiyetin mümessili olabilirler. Cebren ve hile ile aziz vatanın, bütün kaleleri zapt edilmiş, bütün tersanelerine girilmiş, bütün orduları dağıtılmış ve memleketin her köşesi bilfiil işgal edilmiş olabilir. Bütün bu şeraitten daha elîm ve daha vahim olmak üzere, memleketin dahilinde, iktidara sahip olanlar gaflet ve dalâlet ve hattâ hıyanet içinde bulunabilirler. Hattâ bu iktidar sahipleri şahsî menfaatlerini, müstevlilerin siyasî emelleriyle tevhit edebilirler. Millet, fakr u zaruret içinde harap ve bîtap düşmüş olabilir.

Ey Türk istikbalinin evlâdı! İşte, bu ahval ve şerait içinde dahi, vazifen; Türk istiklâl ve cumhuriyetini kurtarmaktır! Muhtaç olduğun kudret, damarlarındaki asîl kanda, mevcuttur!



MUSTAFA KEMAL ATATÜRK

# KURDÎ

# 5

## Kurmancî




# NAVEROK


| | | |
|---|---|---|
| Unîteya 1. | Alfabeya Me | 10-26 |
| Unîteya 2. | Ez û Malbata Xwe | 27-40 |
| Unîteya 3. | Xwendingeh û Jîngeha Min | 41-54 |
| Unîteya 4. | Laş û Tenduristî | 55-68 |
| Unîteya 5. | Demsal û Salname | 69-90 |
| Unîteya 6. | Xwarin û Vexwarinên Me | 91-100 |
| Unîteya 7. | Lîstik û Xeberoşk | 101-114 |
| Unîteya 8. | Çalakiyên Serbest | 115-126 |
| Unîteya 9. | Hatûçû-Geştûger | 127-140 |
| | FERHENGOK | 141-146 |


# UNÎTEYA 1.
## Alfabeya Me







# Hevnasîn û silavdayîn




**Berfîn:** Tu çawa yî Azad?
**Azad:** Ez baş im, gelek spas. Tu çawa yî?
**Berfîn:** Ez jî baş im, gelek spas.




Azad: Rozerîn tu ji ku yî?
Rozerîn: Ez ji Wanê me, tu ji ku yî?
Azad: Ez ji Diyarbekirê me.
Rozerîn: Ez bi nasîna te kêfxweş bûm.
Azad: Ez jî kêfxweş bûm.

## Beşa 1. Dema xwendinê

### 1. Tîpên girdek

A B C Ç D E Ê F G H

I Î J K L M N O P Q R

S Ş T U Û V W X Y Z

### 2. Tîpên hûrdek

a b c ç d e ê f g h

i î j k l m n o p q r

s ş t u û v w x y z



## Beşa 2. Dema xwendin û nivîsînê


**a. Tîpên jêrîn bixwînin û awayên wan ên hûrdek binivîsin.**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| A C D | E F Ê | B Ç H | Y Z I | X U W |
| .......... | .......... | .......... | .......... | .......... |
| G V Û | Î J O | Q M L | T H R | N Ş K |
| .......... | .......... | .......... | .......... | .......... |
| P S V | X Ê W | Î Q Û | I R O | W U X |
| .......... | .......... | .......... | .......... | .......... |

**b. Tîpên jêrîn bixwînin û awayên wan ên girdek binivîsin.**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| a z b | y c x | ç w v | û d t | e ş s |
| .......... | .......... | .......... | .......... | .......... |
| r ê f | q h o | p l m | g i k | l î n |
| .......... | .......... | .......... | .......... | .......... |
| m a q | w q ê | x j û | a b z | w û x |
| .......... | .......... | .......... | .......... | .......... |

## Beşa 3. Dema xwendinê




### a. Tîpên dengdêr

Dengdêrên girdek: A E Ê I Î O U Û
Dengdêrên hûrdek: a e ê i î o u û

### b. Tîpên bêdeng

Bêdengên girdek: B C Ç D F G H J K L M N P Q R S Ş T V W X Y Z
Bêdengên hûrdek: b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z



### c. Pevdeng

Xw: xwendin, xwîn, bixwîne, xwe, xwê, xwelî, xweş



## Beşa 4. Dema xwendinê

### a. Tîpên dengdêr bi nîşaneya √ nîşan bidin.

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| D......... | R......... | I......... | O......... | L......... | U......... |
| A......... | H......... | Q......... | Z......... | T......... | N......... |
| C......... | Ê......... | W......... | J......... | Û......... | Ç......... |
| V......... | E......... | X......... | B......... | Î......... | S ......... |

### b. Bêjeyên jêrîn bixwînin.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| ÎRO | DOZ | AXA | YEK | HÊK |
| XOF | BIR | FÊR | SER | QAL |
| KAL | WAR | ZÊR | SAZ | BÎR |
| XWÊ | DÊR | KÛR | MAR | ZER |
| MÊR | MÎR | ŞÊX | VIR | TÛR |

### c. Bêjeyên jêrîn bixwînin.

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| mêr | mîr | şêx | vir | tûr | îro | doz | axa | yek | hêk |
| xof | bir | fêr | qal | kal | war | yar | zêr | saz | bîr |
| xwê | dêr | kûr | mar | zer | ser | car | hûr | pir | kêr |



## Beşa 5. Dema guhdarîkirin û xwendinê

### Tîp û Bêje!

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| A a | Av | agir | N n | Nan | nêrî |
| B b | Bar | bajar | O o | Por | dor |
| C c | Cêwî | ceh | P p | Paç | pel |
| Ç ç | Çal | çav | Q q | Quling | qijik |
| D d | Dapîr | dar | R r | Roj | rê |
| E e | Elok | ez | S s | Sêv | sênî |
| Ê ê | Êvar | êzing | Ş ş | Şivan | şev |
| F f | Ferheng | firingî | T t | Tû | tîr |
| G g | Ga | goşt | U u | Gul | kund |
| H h | Hêk | hinar | Û û | Mû | bilûr |
| İ i | Bira | kiras | V v | Tav | kavir |
| Î î | Îsot | încas | W w | Welat | werdek |
| J j | Jîjo | jajî | X x | Xezal | xiyar |
| K k | Kîso | kevir | Y y | Yek | çay |
| L l | Lepik | lêv | Z z | Zer | zêr |
| M m | Mar | masî | Xw | Xwê | xwelî |



## Beşa 6. Dema axaftin û nivîsînê

### a. Tîpên jêrîn di nava bêjeyekê de bi kar bînin.

| | | |
|---|---|---|
| Ş.................. | Y.................. | Q.................. |
| Û.................. | XW.................. | U.................. |
| X.................. | P.................. | I.................. |
| Ç.................. | R.................. | J.................. |

### b. Tîpên jêrîn di nava bêjeyekê de bi kar bînin.

| | | |
|---|---|---|
| C.................. | H.................. | O.................. |
| A.................. | K.................. | M.................. |
| G.................. | N.................. | Ê.................. |
| B.................. | L.................. | Î.................. |

### c. Tîpên jêrîn di nava bêjeyekê de bi kar bînin.

| | |
|---|---|
| D.................. | T.................. |
| F.................. | V.................. |
| E.................. | Z.................. |
| S.................. | W.................. |



## Beşa 7. Dema axaftin û nivîsînê


**_Navên wêneyên jêrîn bibêjin û binivîsin!_**











........................ ........................ ........................ ........................









........................ ........................ ........................ ........................









........................ ........................ ........................ ........................

## Beşa 8. Dema xwendinê

### Tîpên nêzdeng bixwînin!

e - ê
zer - zêr
ker - kêr
mer - mêr

i - î
birin - birîn
kirin - kirîn
pir - pîr

u - û
kur - kûr
tu - tû

h - x
hêz - xêz
hîç - xîç
hew - xew

v - w
ev - ew
dev - dew
hev - hew

k - q
ker - qer
kelandin - qelandin
kelem - qelem

# Beşa 9. Dema lîstikê
## Lîstika tîpan




Azad: Ê
Berfîn: Êzing
Azad: A
Berfîn: Agir
Azad: Î
Berfîn: Îsot
Azad: Q
Berfîn: Qijik
Azad: M
Berfîn: Masî
Azad: W
Berfîn: Wêne
Azad: X
Berfîn: Xanî
Azad: Xw
Berfîn: Xwê
Azad: Her bijî Berfîn.
**Berfin:** Spas Azad can.

## Beşa 10. Dema jimartinê

### E m  b i j m ê r i n !

| | | | |
|---|---|---|---|
| 1 | yek | 11 | yazdeh |
| 2 | du | 12 | diwazdeh |
| 3 | sê | 13 | sêzdeh |
| 4 | çar | 14 | çardeh |
| 5 | pênc | 15 | pazdeh |
| 6 | şeş | 16 | şazdeh |
| 7 | heft | 17 | hevdeh |
| 8 | heşt | 18 | hejdeh |
| 9 | neh | 19 | nozdeh |
| 10 | deh | 20 | bîst |



## Beşa 11. Dema axaftin û nivîsînê

### a. Navên jimareyên jêrîn bibêjin û binivîsin.

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 |
|---|---|---|---|---|---|
| ......... | ......... | ......... | ......... | ......... | ......... |

### b. Navên jimareyên jêrîn bibêjin û binivîsin.

| 7 | 8 | 9 | 10 | 11 | 12 |
|---|---|---|---|---|---|
| ......... | ......... | ......... | ......... | ......... | ......... |

### c. Navên jimareyên jêrîn bibêjin û binivîsin.




| | | | |
|---|---|---|---|
| 13 | 14 | 15 | 16 |
| ......... | ......... | ......... | ......... |
| 17 | 18 | 19 | 20 |
| ......... | ......... | ......... | ......... |








## Beşa 12. Dema axaftin û nivîsînê

**a. Jimareyên kîso, dîk û jîjoyên jêrîn bibêjin û binivîsin.**

.......................... .......................... ..........................

**b. Jimareyên nan, sêv û zebeşên jêrîn bibêjin û binivîsin.**

.......................... .......................... ..........................

## Beşa 13. Dema xwendina sirûdê

### SIRÛDA TÎPAN

Em şagirt in, em dixwînin, A, B, C,
Nivîsandin, ew ji me re armanc e.
Tîpên me tev sî û yek in, Ç, D, E,
Xweşî ev e, bi zimanê kurdmanc e.

Ê, F, G, H, hem rehet e, hem şîrîn.
I, Î, J, K, xweş dixwînim bi qîrîn.
L, M, N, O, hê mayîne hinên din.
Gelî kurdan, werin tev de bixwînin.

P, Q, R, S, Ş, T, U, Û, tu meyze
V, W, X, ne, ez şaş nakim yek levze.
Heşt dengdêr in, heçî bêdeng bîst û sê
Riya ronî xwendingeh e, ma Y, Z.

**Hisênê Emîn**

## NOTÊN UNÎTEYA 1.

# UNÎTEYA 2.

## Ez û Malbata Xwe










## Beşa 1. Dema xwendin û axaftinê

# Danên rojê

# Beyanî baş




Zeyneb: Tu çawa yî Zana?

Zana: Ez baş im, gelek spas. Tu çawa yî?

Zeyneb: Ez jî baş im, gelek spas.




## Beşa 2. Dema nivîsînê

### Valahiyên jêrîn dagirin

| | |
|---|---|
| Beyanî baş. | Ez....................................................... |
| ........................................................................ | .......................................................? |
| Tu çawa yî? | Navê min Zeyneb e. |

## Beşa 3. Dema xwendin û axaftinê

# Roj baş




| | |
|---|---|
| Berfîn: | Tu çawa yî Azad? |
| Azad: | Ez baş im spas dikim. |
| Berfîn: | Azad tu diçî ku? |
| Azad: | Ez diçim xwendingehê? |
| Berfîn: | Ez jî diçim xwendingehê. |
| Azad: | Baş e, em bi hev re biçin. |

## Beşa 4. Dema nivîsînê

### Valahiyên jêrîn dagirin

Tu çawa yî?
Ez.......................

Tu diçî ku?
Ez................................................


Ez jî diçim xwendingehê.

Baş e,..........................................



## Beşa 5. Dema xwendin û axaftinê

# Êvar baş




**Rewşen:** Ev kî ye?
Hesen: Ev bavê min e, navê wî Mistefa ye.
**Rewşen:** Bavê te çi karî dike?
Hesen: Bavê min mamoste ye.



## Beşa 6. Dema nivîsînê

### Valahiyên jêrîn dagirin

Êvar baş.
..................................................................................................

Ev kî ye?
..................................................................................................

Bavê te çi karî dike?
..................................................................................................

## Beşa 7. Dema xwendin û axaftinê

# Şev baş




Sînem: Tu bi xêr hatî.
Ronî: Di nava xêrê de bî.
Sînem: Em çi bikin?
Ronî: Em spartekên xwe çê bikin.
Sînem: Baş e, em bi hev re bixebitin.
Ronî: Spartekên me qediyan, ez dê biçim.
Sînem: Ser çavan.
Ronî: Bi xatirê te.
Sînem: Bi xêr biçî.

## Beşa 8. Dema nivîsînê

### Valahiyên jêrîn dagirin

Şev baş.
..............................................................................

Tu bi xêr hatî.
..............................................................................

Bi xatirê te.
..............................................................................

## Beşa 9. Dema xwendin û axaftinê

# Xwe bide nasîn




Delal: Tu ji ku yî?
Ronî: Ez ji Mêrdînê me, tu ji ku yî?
Delal: Ez ji Dêrsimê me. Tu di pola çendan de yî?
Ronî: Ez di pola pêncan de me.
Delal: Tu çend salî yî?
Ronî: Ez deh salî me, tu çend salî yî?
Delal: Ez yazdeh salî me.
Ronî: Ez kêfxweş bûm.
Delal: Ez jî kêfxweş bûm.

## Beşa 10. Dema axaftinê




## Beşa 11. Dema nivîsînê

**Valahiyên li kêlekê dagirin.**

Navê min..................................................

Ez ji.........................................................


Ez di pola..............................de dixwînim.

Ez..............................................salî me.

# Beşa 12. Dema axaftinê

## Ez malbata xwe didim nasîn

**Navê bavê min Harûn e. Malbata min ji heft kesan pêk tê: Bapîrê min, dapîra min, bavê min, diya min, xwişka min û birayê min. Ez ji malbata xwe pir hez dikim.**



## Beşa 13. Dema axaftinê

# Hevalên xwe bide nasîn




Baran diçe xwendingeha seretayî.
Ew di pola 4-Ayê de dixwîne.

Zozan diçe xwendingeha navîn.
Ew di pola 5-Byê de dixwîne.

## Beşa 14. Dema xwendin û axaftinê

**Hobiyên me**

| | |
|---|---|
| Azad: | Ez ji xwendinê pir hez dikim. |
| Baran: | Ez ji werzişê hez dikim. |
| Kerem: | Ez bi ajotina bisiklêtê kêfxweş dibim. |
| Husna: | Ez bi xwedîkirina masiyan kêfxweş dibim. |
| Adem: | Ez ji çêkirina wêneyan gelekî hez dikim. |

## Beşa 15. Dema axaftinê

# Malbata xwe bide nasîn




## Beşa 16. Dema nivîsînê

### Valahiyên jêrîn dagirin

Malbata te ji çend kesan pêk tê?

..................................................................................................

Bavê te çi karî dike?

..................................................................................................

Diya te çi karî dike?

..................................................................................................

Çend xwişk û birayên te hene?

..................................................................................................

Tu diçî xwendingehê?


..................................................................................................

Tu di pola çendan de yî?

..................................................................................................

## Beşa 17. Dema axaftinê

# Di malbatê de jiyan




Diya min mamoste ye.



Mamê min berber e.



Bavê min nûjdar e.

## Beşa 18. Dema nivîsînê

**Valahiyên li kêlekê dagirin**

Diya min..............................................................ye.

Bavê min...............................................................e.

Meta min....................................................malê ye.

Mamê min.............................................................e.

## Beşa 19. Dema axaftinê
# Kar û pîşe




Ez nanpêj im, di firinê de nan dipêjim.



Ez mamoste me. Dersa xwendekaran didim. Ez ji zarokan hez dikim.





Ez hosteyê dîwaran im, dîwaran lê dikim.



Ez nûjdar im. Bi tenduristiya mirovan re mijûl im.

Ez hemşîre me. Ez alîkariya nexweşan dikim.

## NOTÊN UNÎTEYA 2.

# UNÎTEYA 3.

## Xwendingeh û Jîngeha Min










## Beşa 1. Dema guhdarîkirin û xwendinê


# Xwendingeha min



| | |
|---|---|
| Serhed: | Tu diçî kîjan xwendingehê? |
| Mûsa: | Ez diçim Xwendingeha Selahedînê Eyûbî. Tu? |
| Serhed: | Ez jî diçim Xwendingeha Ehmedê Xanî. |
| Mûsa: | Tu di kîjan polê de yî? |
| Serhed: | Ez di pola 5-Byê de me. Tu di kîjan polê de yî? |
| Mûsa: | Ez jî di pola 5-Ayê de me.<br>Tu herî zêde ji kîjan dersê hez dikî? |
| Serhed: | Ez herî zêde ji dersa kurdî hez dikim. |
| Mûsa: | Ez jî ji dersa dîrokê hez dikim. |
| Serhed: | Ez ji bo te serkeftinê dixwazim. |
| Mûsa: | Serkeftin ji bo te jî. |

## Beşa 2. Dema xwendin û axaftinê

# Dersên me



Ez di dersa bîrkariyê de mijara jimareyan hîn dibim.



Ez di dersa kurdî de hînî zimanê xwe dibim.




Ez di dersa komelayetiyê de mijarên çandî hîn dibim.




Ez di dersa dînî de jiyana pêxemberan hîn dibim.

Ez di dersa werzişê de
bi topê dilîzim.





Em dersa xwe ya fenê li
laboratiwarê dikin.

Ez di dersa muzîkê de
stranan dibêjim.






## Beşa 3. Dema nivîsînê


### Valahiyên jêrîn dagirin

Mijara jimareyan di dersa.......................................................de tê hînkirin.
Ez zimanê xwe di dersa..........................................................de hîn dibim.
Mijarên çandî di dersa...........................................................de tên hînkirin.
Jiyana pêxemberan di dersa...................................................de tê hînkirin.
Stran di dersa.........................................................................de tên hînkirin.

## Beşa 4. Dema xwendinê


# Kelûpelên xwendingehê

























## Beşa 5. Dema guhdarîkirin û xwendinê

# Çalakiyên koman



- Ez ji xwendinê hez dikim, ji ber vê ez ketim koma pirtûkxaneyê.

- Ez ji stranan hez dikim, ji ber vê ez ketim koma muzîkê.

- Ez ji futbolê hez dikim, ji ber vê ez ketim koma werzişê.

- Ez ji siruştê hez dikim, ji ber vê ez ketim koma jîngehparêziyê.

- Ez ji lîstikvaniyê hez dikim, ji ber vê ez ketim koma şanoyê.



- Ez ji govendê hez dikim, ji ber vê ez ketim koma folklorê.



## Beşa 6. Dema lîstikê

## Navên koman bi wêneyên jêrîn re hevyek bikin.

Koma pirtûkxaneyê



Koma muzîkê




Koma werzişê



Koma jîngehparêziyê



Koma folklorê



Koma şanoyê





## Beşa 7. Dema guhdarîkirin û xwendinê

# Jîngeha min



Dildar: Mala me li Diyarbekirê ye. Em li taxa Peyasê rûdinin.
Mîrza: Mala me jî li gundê Xanê ye.
Dildar: Li hemberî mala me parkek heye.
Mîrza: Li hemberî mala me jî çemek heye.
Dildar: Li bajarê me milyonek mirov dijîn.
Mîrza: Li gundê me sê sed mirov dijîn.
Dildar: Bavê min mamoste ye, li xwendingeha navîn dixebite.
Mîrza: Bavê min jî cotkar e û karê çandiniyê dike.
Dildar: Em di avahiyeke heftqatî de dijîn, mala me di qata şeşan de ye.
Mîrza: Xaniyê me du qat e, di nava baxçeyekî fireh de ye û di baxçeyê me de jî hewzeke mezin heye.
Dildar: Xwezî mala me jî li gund bûya!
Mîrza: Tu dixwazî vê havînê bêyî gundê me?
Dildar: Belê, ez dê gelek kêfxweş bibim.
Mîrza: Ser çavan were, ez jî dê bi hatina te kêfxweş bibim.

## Beşa 8. Dema xwendinê

# Bajar û gund

Li bajaran sînema heye.
Li gundan sînema nîne.

Li bajaran bazargehên mezin hene.
Li gundan bazargehên mezin nînin.

Li gundan zevî û rez hene.
Li bajaran zevî û rez nînin.

Li gundan gelek ajel hene.
Li bajaran gelek ajel nînin.

## Beşa 9. Dema nivîsînê

### Valahiyên jêrîn dagirin

| | |
|---|---|
| Li bajaran .................. heye. | Li gundan ……………..…. hene. |
| Li gundan .................. nîne. | Li bajaran ……………..…...nînin. |
| Li bajaran .................. hene. | Li gundan ……………..……hene. |
| Li gundan.................. nînin. | Li bajaran ……………….nînin. |

## Beşa 10. Dema xwendinê

# Jûrên xanî




Jûra razanê



Jûra rûniştinê



Jûra zarokan



Pêjgeh



Daşir



Serşok



Destşok



## Beşa 11. Dema nivîsînê

### Valahiyên jêrîn dagirin

..............................................................................................cihê razanê ye.


...........................................................................................cihê rûniştinê ye.

.........................................................................................cihê serşûştinê ye.

.............................................................................................cihê xwarinê ye.


.....................................................................................cihê bêhnvedanê ye.

.......................................................................................cihê destşûştinê ye.



## Beşa 12. Dema xwendinê

## Reng






## Beşa 13. Dema nivîsînê

**Rengên heyberên jêrîn binivîsin.**

Pembû ……………… ye.

Derya …………………..e.

Kevz ………………..…..e.

Zêr ……………………..e.

Zeytûn ………………..e.

Firîngî ………………..e.

## NOTÊN UNÎTEYA 3.

# UNÎTEYA 4.
## Laş û Tenduristî









## Beşa 1. Dema xwendinê

# Laşê me








## Beşa 2. Dema lîstikê

### Wêneyên endaman û navên wan hevyek bikin.

Poz

Çav

Dest

Por

Guh

Dev

Diran

Ling





## Beşa 3. Dema guhdarîkirin û xwendinê

# Endamên laşê me



**Gulistan:** Serdar tu dizanî çavên me bi kêrî çi tên?
**Serdar:** Em bi çavên xwe tiştan dibînin.
**Gulistan:** Pozê me bi kêrî çi tê?
**Serdar:** Em bi pozê xwe bêhn dikin.
**Gulistan:** Guhên me bi kêrî çi tên?
**Serdar:** Em bi guhên xwe dengan dibihîzin.
**Gulistan:** Devê me bi kêrî çi tê?
**Serdar:** Em bi devê xwe xurekan dixwin û vexurekan vedixwin.
**Gulistan:** Diranên me bi kêrî çi tên?
**Serdar:** Em bi diranên xwe xurekan dicûn.



## Beşa 4. Dema nivîsînê

### Valahiyên jêrîn dagirin

Ez bi..........................................................................................xwe tiştan dibînim.
Ez bi pozê xwe..................................,...................................................dikim.
Ez bi guhên.........................................................................................................
Ez bi..........................xwe xurekan dixwim û vexurekan..................................
Ez bi......................................................................................xwe xurekan dicûm.

## Beşa 5. Dema lîstikê

**Bêjeyên jêrîn di xaçepirsê de bibînin.**

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Z | C | E | H | W | M | L | S |
| T | A | P | Ç | A | V | S | L |
| F | L | A | M | I | L | E | Ê |
| Ê | I | T | I | L | Î | R | V |
| Û | N | I | R | Û | L | Î | E |
| Q | G | K | E | M | D | E | V |
| J | Î | M | I | J | A | N | G |

LÊV

DEV

PATIK

MIL

LING

RÛ

SER

TILÎ

ÇAV ☺

MIJANG

**Beşa 6. Dema xwendinê**

# Tenduristiya me Paqijî



Ez ser û çavê xwe dişom.



Ez neynûkên xwe jê dikim.



Ez porê xwe şeh dikim.



Ez derdora xwe paqij dikim.

## Beşa 7. Dema nivîsînê

# Azad çi dike?

***Li wêneyan binêrin û valahiyan dagirin.!***




## Beşa 8. Dema xwendinê

# Em xwe ji mîkroban biparêzin

***Ji bo em nexweş nekevin, divê em çi bikin?***



Parza, zarokan ji nexweşiyan diparêze.



Ez av im, bê min jiyan nabe.



Em vîtamîn in, li dijî mîkroban hêz didin we.



Ez hestiyên zarokan xurt dikim.



## Beşa 9. Dema nivîsînê

**Valahiyan bi bêjeyên “parza, roj, vîtamîn û av”ê dagirin.**

Li dijî mîkroban hêz dide mirovan:.........................................

Hestiyên zarokan xurt dike:.........................................................

Bê wê jiyan nabe:.......................................................................

Zarokan ji nexweşiyan diparêze:...............................................



## Beşa 10. Dema guhdarîkirin û xwendinê

# Ez dikarim xwe ji nexweşiyan biparêzim

- Ez mêweyan dişom û dixwim.
- Ku min xwêdan dabe ez ava cemidî venaxwim.
- Berî xwarinê û piştî xwarinê ez destên xwe dişom.
- Di bêhnvedanê de ez paceyên polê vedikim.
- Ez xurekên biserçûyî nakirim.
- Ez bi diranên xwe, tiştên hişk naşkînim.
- Ez cilên xwe li gorî rewşa hewayê li xwe dikim.



## Beşa 11. Dema nivîsînê

**! *Valahiyên jêrîn bi bêjeyên rast dagirin.***

Ez bi diranên xwe, tiştên hişk ...................................... naşkînim-dişkînim

Berî xwarinê û piştî xwarinê ez destê xwe ................... naşom-dişom

Di bêhnvedanê de ez paceyên polê............................ venakim-vedikim

Ez cilên xwe li gorî rewşa hewayê li xwe ..................... nakim-dikim

Ku min xwêdan dabe ez ava cemidî............................ vedixwim-venaxwim

Ez berî xwarina mêweyan, wan. .................................. naşom-dişom

Ez xurekên biserçûyî.................................................. dikirim-nakirim





## Beşa 12. Dema xwendinê

# Alîkariya bilez

**Di çenteyê alîkariya bilez de pembû, tendirdiyot, meqes, banda birînê, banda pêçanê û çapûtê pêçanê hene.**



- Pembû ji bo paqijkirina birînê ye.
- Meqes ji bo jêkirina çapûtê pêçanê ye.
- Tendirdiyot ji bo kuştina mîkroban e.
- Çapûtê pêçanê ji bo pêçana birînê ye.
- Banda birînê ji bo sergirtina birînê ye.
- Banda pêçanê ji bo girêdana çapûtê pêçanê ye.





## Beşa 13. Dema nivîsînê

### Li hemberê bêjeyan yan “heye” yan jî “nîne” binivîsin.

Di çenteyê alîkariya bilez de:

| | | | |
|---|---|---|---|
| Pembû | : ............ | Meqes | : ............ |
| Defter | : ............ | Jêbir | : ............ |
| Tendirdiyot | : ............ | Çapûtê pêçanê | : ............ |
| Saet | : ............ | Jimartek | : ............ |



## Beşa 14. Dema nivîsînê

### Valahiyên jêrîn dagirin

………………...ji bo kuştina mîkroban e.

………………...ji bo pêçana birînê ye.

………………...ji bo girêdana çapûtê pêçanê ye.

………………...ji bo paqijkirina birînê ye.

………………...ji bo jêkirina çapûtê pêçanê ye.


………………...ji bo sergirtina birînê ye.

## NOTÊN UNÎTEYA 4.

# UNÎTEYA 5.

## Demsal û Salname










## Beşa 1. Dema guhdarîkirin û xwendinê

# Demsal

## Bihar



Hêlîn:
Navê min Hêlîn e.
Ez ji biharê hez dikim.
Bihar demsaleke xweş e.
Hewa germ dibe û baran dibare.
Zarok, di kolanan de bûka baranê digerînin.
Di biharê de gul û giya şîn dibin.
Dar kulîlkan vedikin.
Siruşt geş dibe.

## Beşa 2. Dema nivîsînê

### Li hemberî hevokên jêrîn nîşaneya rast (R) an jî çewt (Ç) daynin.



Zarok, di kolanan de bûka baranê digerînin. (……)

Di biharê de kulîlk vedibin. (……)

Di biharê de dar kulîlkan venakin. (……)

Di biharê de berf dibare. (……)

Di biharê de giya şîn dibin. (……)


Di biharê de hewa sar dibe. (……)

Di biharê de siruşt geş dibe. (……)



## Beşa 3. Dema guhdarîkirin û xwendinê

# Havîn



Azad:

Navê min Azad e.

Ez ji havînê hez dikim.

Havîn demsaleke germ e.

Di havînê de berên zeviyan çê dibin.

Mêwe digihîjin, sebze zêde dibin.


Dinya sayî ye û ez jî avjeniyê dikim.

## Beşa 4. Dema nivîsînê

### Valahiyên Jêrîn bi bêjeyên rast dagirin.




| | | | |
|---|---|---|---|
| Di havînê de mêwe ………. | digihîjin | - | nagihîjin |
| Azad ji havînê hez ……….. | dike | - | nake |
| Di havînê de dinya ………. | bi ewr e | - | sayî ye |
| Di havînê de berên zeviyan ………. | çê dibin | - | çê nabin |
| Havîn demsaleke ………. e. | germ | - | sar |
| Azad avjeniyê……….. | nake | - | dike |
| Di havînê de sebze zêde……….. | dibin | - | nabin |





## Beşa 5. Dema guhdarîkirin û xwendinê

# Payîz



**Beybûn:**

Navê min Beybûn e.

Ez ji payîzê hez dikim.

Payîz demsaleke hênik e.

Di payîzê de pelên daran zer dibin û diweşin.

Germ dikeve, serma zêde dibe û şilî dest pê dike.

Ez diçim rez û tirî dixwim.



## Beşa 6. Dema nivîsînê

**Li hemberî hevokên jêrîn, nîşaneya rast (R) an jî çewt (Ç) deynin.**



| | |
|---|---|
| Beybûn ji payîzê hez nake. | (……) |
| Payîz demsaleke hênik e. | (……) |
| Di payîzê de pelên daran şîn dibin. | (……) |
| Di payîzê de pelên daran naweşin. | (……) |
| Di payîzê de germ zêde dibe. | (……) |
| Di payîzê de serma zêde dibe | (……) |
| Di payîzê de şilî dest pê dike. | (……) |
| Di payîzê de Beybûn diçe rez û tirî dixwe. | (……) |





## Beşa 7. Dema guhdarîkirin û xwendinê

# Zivistan



**Seîd:**

Navê min Seîd e.

Ez ji zivistanê hez dikim.

Zivistan demsaleke sar e, lê bi min xweş e.

Roj kin dibin, şev jî dirêj dibin.

Berf û baran dibarin.

Zarok kalê berfê çê dikin.

Ez digel hevalên xwe li ser berfê kaşûn dikim.

# Beşa 8. Dema nivîsînê

## Valahiyên jêrîn dagirin



| | | | |
|---|---|---|---|
| Seîd ji zivistanê hez ......... | dike | - | nake |
| Zivistan demsaleke …….. e. | germ | - | sar |
| Zivistan bi Seîd …….. e. | xweş | - | nexweş |
| Zivistanê roj …….. dibin. | dirêj | - | kin |
| Zivistanê şev …….. dibin. | dirêj | - | kin |
| Zivistanê berf û baran ……... | nabarin | - | dibarin |
| Zivistanê zarok kalê berfê……... | çê dikin | - | çê nakin |



## Beşa 9. Dema xwendinê

# Rewşa hewayê


Hewa sayî ye.


Berf dibare.


Hewa ewrî ye.


Bager çê dibe.


Hewa şilî ye.


Bahoz radibe.

## Beşa 10: Dema helbestê



### BARAN

Ewrek hate asmanî
Baranek gel xwe anî
Rijande serê çiya
Şîn kirin gul û giya
Tev newal û der û deşt
Xemlandin mîna bihişt
De ka rabin cotyaran
Bikêlin tev beyaran
Tu lez ke û bilezîne
Warê xwe bixemlîne
Baranê lê ke lê ke
Xetîra jînê pê ke


**Azad Mizûrî**

## Beşa 11. Dema xwendinê

# Meh

Sal, diwazdeh meh e.
Meh sî roj e.

1 Kanûna Paşî
2 Sibat
3 Adar
4 Nîsan
5 Gulan
6 Hezîran
7 Tîrmeh
8 Tebax
9 Îlon
10 Çiriya Pêşî
11 Çiriya Paşî
12 Kanûna Pêşî





## Beşa 12. Dema nivîsînê

### Bersiva pirsên jêrîn bidin.

1. Sal çend meh e? ......................................
2. Meh çend roj e? ......................................
3. Nîsan meha çendan e? ......................................
4. Sibat meha çendan e? ......................................
5. Gulan meha çendan e? ......................................



## Beşa 13. Dema lîstikê




### *Bi tîpên jêrin navên mehan binivîsin.*

| | | | |
|---|---|---|---|
| anûnak şîpa | :..................... | mehtîr | :..................... |
| batsi | :..................... | baxte | :..................... |
| dara | :..................... | onîl | :..................... |
| sannî | :..................... | riçiya şîpê | :..................... |
| langu | :..................... | riyaçi şîpa | :..................... |
| zîheran | :..................... | ûnanka şîpê | :..................... |

## Beşa 14. Dema xwendinê

# Her demsal sê meh e.



**Mehên Biharê**

1. Adar
2. Nîsan
3. Gulan



**Mehên Havînê**

1. Hezîran
2. Tîrmeh
3. Tebax




**Mehên Payîzê**

1. Îlon
2. Çiriya Pêşî
3. Çiriya Paşî



**Mehên Zivistanê**

1. Kanûna Pêşî
2. Kanûna Paşî
3. Sibat



## Beşa 15. Dema xwendinê

# Hefte

**Hefteyek heft roj e.**

1 Duşem
2 Sêşem
3 Çarşem
4 Pêncşem
5 În
6 Şemî
7 Yekşem



## Beşa 16. Dema lîstikê

***Bi tîpên jêrin navên rojan binivîsin.***

şemdu ....................
şemsê ....................
şemçar ....................
şempênc ....................
nî ....................
mîşe ....................
şemyek ....................



## Beşa 17. Dema nivîsînê

**Valahiyên jêrîn bi rojên hefteyê dagirin.**

Duşem ............ Çarşem ............ În ........... Yekşem



## Beşa 18. Dema guhdarîkirin û xwendinê

# Roj











Bawer: Ez dê derheqê rojê de hinek pirsan ji te bikim.
Hêlîn: Kerem bike.
Bawer: Roj çend saet e?
Hêlîn: Bîst û çar saet e.
Bawer: Roj çend dan e?
Hêlîn: Pênc dan e.
Bawer: Danê yekem kîjan e?
Hêlîn: Sibeh e. Sibeh, destpêka rojê ye û her kes diçe ser karê xwe.
Bawer: Danê duyem kîjan e?
Hêlîn: Nîvro ye. Nîvro dema firavînê ye.
Bawer: Danê sêyem kîjan e?
Hêlîn: Berêvar e. Berêvar, di navbera nîvro û êvarê de ye.
Bawer: Danê çarem kîjan e?
Hêlîn: Êvar e. Êvarê roj diçe ava, her kes diçe mala xwe.
Bawer: Danê pêncem kîjan e?
Hêlîn: Şev e. Şev, dema bêhnvedan û razanê ye.
Bawer: Her bijî Hêlîn.
Hêlîn: Spas Bawer can.



## Beşa 19. Dema nivîsînê

**Valahiyên jêrîn bi bêjeyên “sibeh, nîvro, û şev”ê dagirin.**

………, dema bêhnvedan û razanê ye.

………, dema firavînê ye.

………, destpêka rojê ye û her kes diçe ser karê xwe………



## Beşa 20. Dema axaftinê

# Saet çend e?

Saet yek e. (01:00)




Saet diwazdeh e. (12:00)




....:30 nîv

Saet sisê û nîv e. (03:30)




Saet deh û nîv e. (10:30)




....:15 çaryek

Saet ji pêncan çaryekek dibihure. (05:15)
Saet pênc û çaryek e.




Saet ji yazdehan çaryekek dibihure. (11:15)
Saet yazdeh û çaryek e.




Maye/kêm

Saet ji şeşan re maye bîst deqîqe. (05:40)
Saet şeş kêm bîst e.




Saet ji diwazdehan re maye penc deqîqe. (11:55)
Saet diwazdeh kêm penc e.




Dibihure

Saet ji dehan deh deqîqe dibihure. (10:10)
Saet deh û deh e.




Saet ji nehan yazdeh deqîqe dibihure. (09:11)
Saet neh û yazdeh e.





## Beşa 21. Dema nivîsînê

**_Saetên jêrîn binivîsin._ !**

01:00 ..................................................

02:00 ..................................................

03:15 ..................................................

04:15 ..................................................

05:30 ..................................................

06:30 ..................................................

07:55 ..................................................

08:41 ..................................................

09:07 ..................................................

10:12 ..................................................

11:15 ..................................................

12:20 ..................................................

## Beşa 22. Dema xwendinê

# Cejna Newrozê

Newroz, cejna serê salê û destpêka biharê ye. Her sal di bîst û yekê adarê de tê pîrozkirin. Jin û mêr, keç û xort, pîr û zarok cilên xwe yên xweşik û rengîn li xwe dikin û derdikevin derve. Her kes li dora agirê Newrozê govend digire.

Di Newroza îsal de ji bo pîrozbahiya cejnê Binefş diçe konsera Şivan Perwer. Lewra Binefş ji stranên wî gelekî hez dike.

Baran û hevalên xwe jî diçin seyrangeha Kaniya Spî. Li seyrangehê govend digirin û bi topê dilîzin. Piştî ku firavînê dixwin bermayên xwe berhev dikin û davêjin çopdankê.



## Beşa 23. Dema lîstikê

**Li hemberî hevokên jêrîn, nîşaneya rast (R) an jî çewt (Ç) deynin.**

Newroz, cejna serê salê û destpêka biharê ye. (.....)

Newroz, her sal di bîst û pêncê adarê de tê pîrozkirin. (.....)

Di Newroza îsal de Binefş diçe konsera Şivan Perwer. (.....)

Lewra Binefş ji stranên Şivan Perwer gelekî hez nake. (.....)

Baran û hevalên xwe diçin seyrangeha Kaniya Spî. (.....)

Piştî ku firavînê dixwin bermayên xwe berhev nakin. (.....)




## NOTÊN UNÎTEYA 5.

# UNÎTEYA 6.

## Xwarin û Vexwarinên Me







## Beşa 1. Dema axaftin û nivîsînê

# Xwarin û vexwarinên me






Ez nan dixwim

Tu penîr dixwî.

Ew mast dixwe.

Em zebeş dixwin.

Hûn hingiv dixwin.

Ew mehîrê dixwin.



Ez avê vedixwim.

Tu şîr vedixwî.

Ew dew vedixwe.

Em çayê vedixwin.


Hûn avmêweyê vedixwin.

Ew xweşavê vedixwin.

## Beşa 2. Dema nivîsînê

### Valahiyên jêrîn bi bêjeyên “dixwim” û “vedixwim”ê dagirin.


| | |
|---|---|
| Ez nan ……………. | Ez xweşavê ……………. |
| Tu şîr ……………. | Tu penîr ……………. |
| Ew avê ……………. | Ew dew ……………. |
| Em zebeş ……………. | Em hingiv ……………. |
| Hûn çayê ……………. | Hûn avmêweyê ……………. |
| Ew mehîrê ……………. | Ew mast ……………. |





## Beşa 3. Dema guhdarîkirin û xwendinê

# Xurekên welatê me



Elîf: Zebeşên kîjan bajarî xweş in?
Rêzan: Zebeşên Diyarbekirê xweş in.
Elîf: Gilyazên kîjan bajarî navdar in?
Rêzan: Gilyazên Mêrdînê gelekî navdar in.
Elîf: Penîrê Wanê çawa ye?
Rêzan: Penîrê Wanê bi sîrik e.
Elîf: Fistiqên kîjan bajaran biçêj in?
Rêzan: Fistiqên Entab û Sêrtê biçêj in.
Elîf: Te hingivê Colemêrgê xwariye?
Rêzan: Erê min xwariye. Hingivê Colemêrgê gelek xweş e.
Elîf: Mişmişên herî xweş li ku çê dibin?
Rêzan: Mişmişên herî xweş li Meletiyê çê dibin.
Elîf: Dema ku tu biçî Bedlîsê tu dê li wir çi bixwî?
Rêzan: Ez dê biryanê bixwim.

## Beşa 4. Dema lîstikê

### Navên xurek û bajarên jêrîn hevyek bikin.

Zebeş

Gilyaz

Penîrê bi sîrik

Meleti

Diyarbekir

Colemêrg

Entab

Wan

Mêrdîn

Fistiq

Hingiv

Mişmiş

## Beşa 5. Dema xwendinê

### Navên hinek xwarinan



Meftûne


Kutilk


Xweşav


Tirşik


Mehîr



Cacix



## Beşa 6. Dema axaftin û nivîsînê


***Hûn jî navên hinek xwarinên devera xwe bibêjin û binivîsin.***

1. ..........................
2. ..........................
3. ..........................
4. ..........................
5. ..........................
6. ..........................
7. ..........................
8. ..........................
9. ..........................
10. ..........................



## Beşa 7. Dema xwendinê

## Navên hinek pêxwarinan


Penîr 


Zeytûn 

Mast 


To 

Dims 

Nîvişk 


Hêk 



## Beşa 8. Dema axaftin û nivîsînê

***Hûn jî navên hinek pêxwarinên devera xwe bibêjin û binivîsin.*** !

1. ……..................
2. ……………….
3. ………………...
4. ………………..
5. ………………..
6. ………………..



## Beşa 9. Dema xwendinê

***Navên hinek vexwarinan*** !

| | | | |
|---|---|---|---|
| Av | Dew | Şerbet | Xweşav |
| Şîr | Çay | Avmêwe | |



## Beşa 10. Dema axaftin û nivîsînê

***Hûn jî navên hinek vexwarinên devera xwe binivîsin.*** !

1. .............................
2. .............................
3. .............................



## Beşa 11. Dema lîstikê

*Navên xurek û vexurekên jêr di xaçepirsê de bibînin.*

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| G | Y | S | I | Ş | Î | R | T | Ş |
| S | K | J | F | X | E | W | I | A |
| H | U | D | E | W | K | Z | R | V |
| E | T | G | J | E | L | E | Ş | Ç |
| D | I | M | S | Ş | A | B | I | A |
| Î | L | W | K | A | L | E | K | Y |
| T | K | N | Î | V | I | Ş | K | A |
| A | H | Ê | K | H | R | Ç | Î | K |

Xweşav

Kutilk

Dims

Dew

Hêk

Şîr

Çay

Tirşik ☺

Kalek

Nîvişk

Av


Zebeş

## NOTÊN UNÎTEYA 6.

# UNÎTEYA 7.

## Lîstik û Xeberoşk







## Beşa 1. Dema lîstikê

### Veşartok



Ristem: Hevalno, ka em **veşartokê bilîzin?**

**Mazlum: Erê, em bilîzin.**

Canan: **Ez jî dilîzim.**

Ceylan: **Ez jî dê bilîzim.**

Ristem: **Baş e, pêşî dê kî ji me bibe pîra holikê?**

**Mazlum: Werin pîra holikê em bi** “*bizdim-badim*”ê diyar bikin!

*Bizdim-Badim*
*Bizdim*
*Badim*
*Bizdim*
*Badim*


**Ceylan bû pîra holikê!!!**

**(Ceylanê berê xwe da dîwar, çavên xwe girtin û hevalên wê xwe veşartin)**


*-Ooooo*
*Êkê Mêkê*
*Qirika çûkê*
*Şah bilbilê*
*Textê çilê*
*Çil çîzanê*
*Ava rengê hezareyê*
*Gur gureyê*
*Bîst li teyê*
*Xwe veşêrin, va hatim we!*

## Beşa 2. Dema xwendinê

### Lîstikên me




Veşartok



Teytok



Darqîtik



Xar




## Beşa 3. Dema lîstikê

### Heval hevaloşkê

*(Zarok destê xwe didin ser milên hev, li kuçe û kolanan diçin û tên û wiha dibêjin)*

Heval hevaloşkê
Nan û penîroşkê
Hevalê min şivan e
Gopalê wî pan e
Ji bo guran derman e



## Beşa 4. Dema axaftin û nivîsînê

Zarokno, hûn jî lîstikekê vebêjin û piştre binivîsin.

## Beşa 5. Dema zûgotinokê

### Zûgotinok

***Hevalno ka dê kî ji we vê zûgotinokê bibêje?***

..................

Rûvî li rê zivirî
Rê li rûvî zivirî

## Beşa 6. Dema axaftinê



*Hevalno ka dê kî ji we vê zûgotinokê bibêje.*

Beran borî di malê de
Min beran xwar
Beraz ma di malê de

## Beşa 7. Dema axaftinê

Çêçik û kûçik di malê de
Çêçik firiya, min çêçik xwar
Kûçik firiya min çêçik xwar

## Beşa 8. Dema axaftinê

*Hûn jî zûgotinokeke nû hîn bibin û ji hevalên xwe re bibêjin.*

.................................................................

## Beşa 9. Dema mamikan

### Mamik

**Hevalno ka dê kî ji we vê mamikê bizane?**

Tiştek heye: Darek e,
Li ser darê hinarek e,
Li ser hinarê gopalek e,
Li ser gopalê ristek e,
Li ser ristê bihûstek e.
Ew çi ye?

(teşî)

## Beşa 10. Dema mamikê

**Hevalno ka dê kî ji we vê mamikê bizane?**

Sê pênc pazdeh û didu hivdeh û sisê bîst

(3x5=15+2= 17+3=20)

Çar û çar û çardeh, bîst û pênc û pazdeh, hivdeyek û du hijdeh dikin çiqas?

(4+4+14+25+15+17+2x18=115)

## Beşa 11. Dema mamikê

### Hevalno ka dê kî ji we vê mamikê bizane?

Tiştek heye:
Kalokek tê ji deştê,
Barê striyan li piştê.
Ew çi ye? (Jîjo)

### Hevalno ka dê kî ji we vê mamikê bizane?

Tiştek heye:
Sê ling, sê dar
Çar ling pê da
Du ling hat û himik lê da.
Ew çi ye? (Mêşk)

### Hevalno ka dê kî ji we vê mamikê bizane?

Tiştek heye:
Daran movik anî,
Maran hingiv anî,
Miyan şîr anî,
Kewan xwe rê danî,
Fesad tazî mayî,
Mîran xwe da alî
Gayan şer hilanî.
Ew çi ye?

(Newroz-hatina biharê)



## Beşa 12. Dema xwendinê

**Bêsol û Bêdiran**

Zarokekî ji zarokekî din re got:

– Çawa dibe, bavê te solfiroş e û tu bê sol î?

Zarokê din jî gotê:

– Ma çawa dibe ku bavê te jî nûjdarê diranan e û tu bê diran î?

Zeynelabîdîn Zinar

## Nûjdarê Çarçav

Zilamek hebû, çavên wî şaş bûn. Gava li mirovekî dinêrî, wek du mirovan didît.

Rojekê zilam radibe û diçe ba nûjdarekî, da ku çareyekê ji çavên xwe re bibîne. Dinêre ku nûjdar li kêleka maseya xwe rûniştiye û serê wî di ber de ye û bi tiştekî re mijûl e. Zilam ji nûjdar re dibêje:

- Gava ez li mirovekî dinêrim, ez wî wek du mirovan dibînim.

Nûjdar serê xwe radike û jê dipirse:

- Ma her çar çavên te jî wisa ne?

Zeynelabîdîn Zinar



## Beşa 13. Dema nivîsînê

Hûn jî pêkenokekê hîn bibin û binivîsin.

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................

## Beşa 14. Dema strînê

**Stran**

### ZIMANÊ KURDÎ

Bi sêr û sur e
Cewahir, durr e
Zimanê kurdî

Bi xeml û rewş e
Şîrîn û xweş e
Zimanê kurdî

Bi xweş awaz e
Letîf û naz e
Zimanê kurdî

Xezel, helbest e
Şemalka dest e
Zimanê kurdî

Beyta Feqî ye
Dengê Xanî ye
Zimanê kurdî

Şikoyê Hesen

## Beşa 15. Dema strînê

Hevalno, strana “Zimanê Kurdî” bi hev re bibêjin.



## Beşa 16. Dema xwendinê

# Xeberoşk

## Dawiya Derewan

Rojekê, şivanekî pezê xwe diçêrand, ji nişka ve kir hawar:

-Hoo, xelkino! Hawar hawar! Zû werin zû, gur pezê min xwar!

Xelkê ji bo rizgarkirina pez, bi lez û bez xwe gihandin hawara wî. Lê bû tiqetiqa şivan, keniya û got:

-Bi Xwedê ne wisa bû, min derew kir.

Rojeke din, dîsa şivan kir hawar hawar û gundiyan dîsa xwe gihand hawara wî. Lê ev jî derew derket.

Di ser van bûyeran re gelek roj hatin û çûn. Rojekê, bi rastî jî gur hat û ket nav pezê vî şivanî. Şivan rabû û kir hawar hawar:

-Hoo, xelkino! Hawar hawar! Gur dawiya pezê min anî, zû werin zû!

Lê belê, xelkê, guhê xwe nedayê, lewra berî niha, wî çend caran derew kiribû. Di encamê de gur pezê wî qir kir.

Ji Pirtûka Xwendina Kurdî Ji bo Pola Seratayî



## Beşa 17. Dema axaftin û nivîsînê

**Di xeberoşka jorîn de xelk çima neçûn hawara şivan? Vebêjin û binivîsin.**

..................................................................................................

..................................................................................................

..................................................................................................

..................................................................................................

## Beşa 18. Dema xwendinê

# Kêzika circirk û kurmorî



Kêzika circirk havînê
Tim dikir kêf û şahî
Tembûra wê di dest de
Distra heta êvarî

Bi sitran û bi govend
Roj dibuhurand li xwe
Zivistana sar serma
Nedianî bîra xwe

Kurmoriya xebatkar
Buhar heta payîzê
Şev û rojan kar dikir
Ji bona zivistanê

Havîn qedya payîz hat
Di pê wê re zivistan
Ji berfê spî bûye
Deşt û çiya û zozan

Dinya bû sar û serma
Her tişt bin berfê de ma
Kêzika me ya circirkê
Bê xwarin û bê qût ma

Çû ber mala kurmorî
Ji bo qût û xwarinê
Kurmoriyê jê pirsî
-Ma te çi kir havînê?

-Min wexta xwe bihurand
Her bi tembûr û stran
-Ê de baş e, niha jî
bigire govend û dîlan.

**M. Lewendî**



## Beşa 19. Dema axaftin û nivîsînê

Peyama xeberoşka jorîn çi ye, bibêjin û binivîsin.

..........................................................................................................

..........................................................................................................

..........................................................................................................


..........................................................................................................

......................................................................................................

## NOTÊN UNÎTEYA 7.

# UNÎTEYA 8.

## Çalakiyên Serbest









## Beşa 1. Dema xwendin û axaftinê

## Çalakiyên serbest

? *Em di demên xwe yên serbest de çi dikin*



**Rênas:**
Ez pirtûkan dixwînim.



**Hesen:**
Ez nameyan dinivîsim.



**Mizgîn:** Ez diçim kursa piyanoyê.





**Loran:**
Ez diçim şanoyê.



## Beşa 2. Dema nivîsînê

**Li gorî agahiyên jorîn valahiyên jêrîn dagirin.**

Ez pirtûkan.....................
Ez nameyan...................
Ez..................... şanoyê.
Ez diçim..........piyanoyê.



## Beşa 3. Dema xwendin û axaftinê

***? Em di demên xwe yên serbest de çi dikin***



**Baran:** Ez diçim kursa tembûrê.



**Soran:** Ez li televîzyonê temaşe dikim.




**Zerga:** Ez çûkan xwedî dikim.




**Ûsiv:** Ez diçim sînemayê.

## Beşa 4. Dema nivîsînê

**Li gorî agahiyên jorîn valahiyên jêrîn dagirin.**



Ez ......... kursa tembûrê.

Ez li televîzyonê.............

Ez..................sînemayê.

Ez çûkan.......................

## Beşa 5. Dema xwendin û axaftinê

**? *Em di demên xwe yên serbest de çi dikin***



**Tajdîn**: Ez bi hevalên xwe re futbolê dilîzim.



**Gulan:** Ez ji xwe re wêneyan çê dikim.



**Seyîd:** Ez di înternetê de malperên zarokan dişopînim.



**Bawer:** Ez masiyan xwedî dikim.

## Beşa 6. Dema lîstikê

**Bêjeyên jêrîn hevyek bikin.**

| | |
|---|---|
| Futbolê | çê dikim |
| Wêneyan | dişopînim |
| Malperên zarokan | xwedî dikim |
| Masiyan | dilîzim |

## Beşa 7. Dema xwendin û axaftinê

### Em di demên xwe yên serbest de çi dikin?



**Rojda:**
Ez li muzîkê guhdarî dikim.



**Goran:**
Ez bi basketbolê dilîzim.



**Senem:**
Ez bi tenîsê dilîzim.



**Aram:**
Ez dawiya hefteyê digel hevalên xwe diçim seyranê.

## Beşa 8. Dema nivîsînê

### Li gorî agahiyên jorîn valahiyên jêrîn dagirin.



Ez li muzîkê............................dikim.

Ez bi basketbolê..............................

Ez dawiya hefteyê digel hevalên xwe ..........................................seyranê.

Ez bi tenîsê.......................................

# Beşa 9. Dema xwendinê

## Cihên çalakiyan

PIRTÛKXANE



SÎNEMA



MUZE




ŞANOGEH



PÊŞANGEH



HOLA WERZIŞÊ



# Beşa 10. Dema lîstikê

**Bi tîpên li kêlekê navên cihên çalakiyan binivîsin.**


| | |
|---|---|
| p i r x a t û k n e | ............................ |
| m a s î n e | ............................ |
| z e m u | ............................ |
| ş a g e h n o | ............................ |
| l o h a z i ş w e r | ............................ |
| g e h ş a n p ê | ............................ |

## Beşa 11. Dema xwendinê

# Cihên çalakiyan

Baxçeyê Ajelan

.................................



Qada Konserê

.................................



Hola Werzişê

.................................



Hewza Avjeniyê

.................................



Seyrangeh

.................................



Navenda Lîstikan

.................................





## Beşa 12. Dema lîstikê

**Wêneyên endaman û navên wan hevyek bikin.**

Hewza avjeniyê 

Seyrangeh 

Baxçeyê ajelan 

Qada konserê 

Hola werzişê 



## Beşa 13. Dema xwendinê

## Cihên çalakiyan

Kursa Muzîkê

..................................



Qada Futbolê

..................................



Sîrk

..................................



Hola Şanoyê

..................................



Akvaryûm

..................................



Lûnapark

..................................





## Beşa 14. Dema lîstikê

**Nav û wêneyên jêrîn hevyek bikin.**



Kursa muzîkê



Qada futbolê



Sîrk



Hola şanoyê



Akvaryûm



Lûnapark



## Beşa 15. Dema xwendinê

### Ez û pirtûkên min

Navê min Loran e. Ez niha diçim pola pêncem. Di demên xwe yên serbest de ez pirtûkan dixwînim. Lewra ez ji xwendina pirtûkan pir hez dikim. Dema ku ez pirtûkekê dixwînim, ez bi lehengên wê re dibim heval, bi wan re digerim û bi wan re dilîzim. Her pirtûk, ji bo min cihanên nû û hevalên nû peyda dike. Ez jî navên van hevalên xwe yên nû di rojnivîska xwe de dinivîsim.



## Beşa 16. Dema lîstikê


**Li hemberî hevokên jêrîn, nîşaneya rast (R) an jî çewt (Ç) deynin.**

| | |
|---|---|
| Loran niha diçe pola şeşem. | (…..) |
| Loran di demên xwe yên serbest de pirtûkan dixwîne. | (…..) |
| Loran ji xwendina pirtûkan pir hez nake. | (…..) |
| Her pirtûk, ji bo Loran cihanên nû û hevalên nû peyda nake. | (…..) |
| Loran navên hevalên xwe yên nû di rojnivîska xwe de dinivîse. | (…..) |


## NOTÊN UNÎTEYA 8.

# UNÎTEYA 9.


## Hatûçû-Geştûger







## Beşa 1. Dema xwendinê
# Hatûçû
## Çirayên hatûçûyê



Çiraya rawestinê


Çiraya amadebûnê

Çiraya derbasbûnê

## Beşa 2. Dema xwendinê
## Rêzikên hatûçûyê



Divê em di ser peyaborê re derbas bibin.



Cihê ku ev nîşane lê hebe, divê em bisiklêta xwe di wir re bajon.



Cihê ku peyabor lê nebe, divê pêşî em li milê çepê, piştre li milê rastê, dîsa li milê çepê binêrin ku wesayît nebin em ê derbas bibin.

## Beşa 3. Dema xwendinê

# Nîşaneyên hatûçûyê



Riya xwendekaran



Riya bisiklêtan




Alîkariya bilez



Peya derbas nabin



Bisiklêt derbas nabin



Nexweşxane



## Beşa 4. Dema guhdarîkirin û xwendinê

# Tu rêzikên hatûçûyê dizanî?

**Rizgar:** Merheba Binefş, tu rêzikên hatûçûyê dizanî?
**Binefş:** Belê, divê her kes bizane.
**Rizgar:** Ku peyarê nebe tu dê çawa bi rê ve biçî?
**Binefş:** Ez dê di rexê rê re biçim.
**Rizgar:** Tu çawa derbasî hemberî rê dibî?
**Binefş:** Ez di ser peyaborê re derbas dibim.
**Rizgar:** Ku peyabor nebe, tu dê çi bikî?
**Binefş:** Ez pêşî li çepê, paşê li rastê, dîsa li çepê dinêrim. Ku wesayît nebin ez derbas dibim.
**Rizgar:** Tu wateya çirayên hatûçûyê dizanî?
**Binefş:** Belê, ez dizanim.
**Rizgar:** Çiraya sor ji bo çi ye?
**Binefş:** Çiraya sor ji bo rawestinê ye.
**Rizgar:** Çiraya zer ji bo çi ye?
**Binefş:** Çiraya zer ji bo amadebûnê ye.
**Rizgar:** Çiraya kesk ji bo çi ye?
**Binefş:** Çiraya kesk ji bo derbasbûnê ye.



## Beşa 5. Dema lîstikê

**Li hemberî hevokên jêrîn, nîşaneya rast (R) an jî çewt (Ç) deynin.**

Ku peyarê nebe Binefş dê di rexê rê re biçe. (……)
Binefş di nav rê re derbas dibe. (……)
Çiraya sor ji bo rawestinê ye. (……)
Çiraya zer ji bo amadebûnê ye. (……)
Çiraya kesk ji bo derbasbûnê ye. (……)

## Beşa 6. Dema xwendinê

# Geştûger




Ez bi texsiyê diçim geştûgerê.



Ez bi bisiklêtê diçim geştûgerê.



Em bi otobûsê diçin geştûgerê.



Em bi keştiyê diçin geştûgerê.



Tu bi trênê diçî geştûgerê.



Hûn bi balafirê diçin geştûgerê.

## Beşa 7. Dema xwendinê

### Wesayîtên taybet û wesayîtên komguhêz

Navê min Solîn e. Ez di nava hefteyê de bi wesayîtên komguhêz diçim xwendingeha xwe. Ez û hevalên xwe di saet heft û nîvan de li rawestgehê hev dibînin. Em li otobusê siwar dibin û diçin xwendingeha xwe. Eger di otobusê de kal, pîr, astengdar û nexweş hebin em cihê xwe didin wan. Ji bo ku mirov tengezar nebin em di wesayîtên komguhêz de bi dengê bilind naaxivin.



Wesayîta me ya taybet jî heye. Em dawiya hefteyê carinan bi wesayîta xwe ya taybet diçin seyrangehê û heta danê êvarê li wir dimînin. Berî ku em vegerin, em bi malbatî bermayên xwe berhev dikin û davêjin çopdankê.

## Beşa 8. Dema nivîsînê

### Li gorî agahiyên jorin bersiva pirsiyarên jêrîn bidin.

1. Solîn çawa diçe xwendingeha xwe?

.......................................................................................................

2. Solîn û hevalên xwe di saet çendan de hev dibînin?

.......................................................................................................

3. Mirov di wesayîtên komguhêz de cih dide kê?

.......................................................................................................

4. Solîn û malbata xwe dawiya hefteyê bi kîjan wesayîtê diçin seyrangehê?

.......................................................................................................

## Beşa 9. Dema xwendinê

### Dîlan û Malbata Xwe Diçin Betlaneyê

Îsal em gelekî xebitîn û westiyan. Niha jî em amadekariya betlaneyê dikin. Îsal em dê biçin Wanê. Li wir em dê li ber peravê bikevin golê, di otêlekê de du hefteyan bimînin. Berî ku em biçin, em dê kelûpelên xwe yên pêwîst amade bikin. Me biryar da ku em dê îsal bi wesayîta xwe ya taybet biçin. Wan, ji bo geştûgerê cihekî gelek xweş û navdar e. Keleha Wanê, Edremît, Girava Axtamarayê û Sûlava Muradiyeyê cihên herî xweş û balkêş ên Wanê ne. Ez bawer dikim, îsal betlaneya me dê pir xweş derbas bibe.



## Beşa 10. Dema nivîsînê

### Li gorî agahiyên jorîn bersiva pirsiyarên jêrîn bidin.

1. Îsal Dîlan û malbata xwe ji bo betlaneyê diçin ku derê?

..........................................................................................................

2. Mirov di wesayîtên komguhêz de cih dide kê?

..........................................................................................................

3. Dîlan û malbata xwe dê bi çi biçin betlaneyê?

..........................................................................................................

4. Dîlan û malbata xwe dê di betlaneyê de li ku bimînin?

..........................................................................................................

## Beşa 11. Dema xwendinê

**Cihên xweş û dîrokî yên ku em dikarin lê bigerin.**



Sûra Diyarbekirê bajarê kevin dorpêç dike û gelek dîrokî ye.



Gola Masiyan li Rihayê ye û cihekî pîroz e.

Çiyayê Nemrûdê li bajarê Semsûrê ye û peykerên dîrokî lê hene.





Girava Axtamarayê li bajarê Wanê ye û cihekî pir xweş e.



Deryaya Spî li başûrê Tirkiyeyê ye.



Şanogeha dîrokî, Aspendos, li Antalyayê ye.



## Beşa 12. Dema nivîsînê

### Valahiyên jêrîn dagirin

1.Sûra Diyarbekirê …………..dorpêç dike û gelek ………… ye.

2.Gola Masiyan li …………ye û cihekî ………….. e.

3.Çiyayê Nemrûdê li bajarê …………..ye û ………….dîrokî lê hene.

4.Deryaya Spî li başûrê …………….ye.

5.Şanogeha dîrokî, Aspendos, li ……………. ye.

## Beşa 13. Dema xwendinê

# Cih û alî




Eger hûn jî bixwazin cih û aliyên xwe bizanin, destê xwe yê rastê bi aliyê rojhilat ve dirêj bikin, wê demê; destê we yê çepê rojava, berê we bakur, pişta we jî başûr nîşan dide.

## Beşa 14. Dema xwendinê

Mala me li **jor**ê xwendingehê ye.
Mala Delalê li **jêr**ê mala me ye.
Nexweşxane li **rojavayê** sînemayê ye.
Zanîngeh li **başûr**ê bajêr e.
Guzergaha rêhesinê ji **bakur** ber bi **başûr** ve ye.
Hêja li **ber** min rawestiye.
Li **dora** golê gelek havîngeh hene.

## Beşa 15. Dema xwendinê



### Mala Azad, Berfîn û Dilgeş

**Azad:** Mala we li ku ye, ez çawa dikarim bêm mala we?

**Berfîn:** Ji bo ku tu bê mala me, divê tu ji sinemayê heta kolana Azadiyê bimeşî, ji dawiya kolana Azadiyê li destê çepê bizîvirî û bi qasî sed gavî bimeşî, li destê rastê avahiyeke derîsor heye, ew mala me ye.

**Dilgeş:** Mala me jî li pişt mala Azad e. Li pêşiya mala me baxçeyekî hinaran heye.

**Berfîn:** Baş e, gelo kes mala Rûmetê dizane?

**Azad:** Erê, ez carekê çûbûm. Mala Rûmetê li jêrê mala me ye. Li jêrê mala me pirtûkxaneyeke mezin heye. Mala Rûmetê li çepê pirtûkxaneyê ye. Di navbera wan de xaniyek heye.

**Berfîn:** Baş e, malên me nêzîkî hev in. Lê mala Rojdayê ji malên me dûr e. Mala Rojdayê li taxa Jîngehê ye. Taxa Jîngehê taxa herî jêr a bajêr e.

**Dilgeş:** Em bi meşê nikarin herin mala Rojdayê, lê otobûs diçin heta ber mala wê.

## Beşa 16. Dema nivîsînê

***Li gorî agahiyên jorîn bersiva pirsiyarên jêrîn bidin.***

1. Mala Berfînê li ku ye?

   .............................

2. Mirov çawa dikare biçe mala Berfînê?

   ..........................................

3. Mala Dilgeş li ku ye?

   ........................................

4. Li pêşiya mala Dilgeş çi heye?

   .........................................

5. Mala Rojdayê li kîjan taxê ye?

   .........................................

## NOTÊN UNÎTEYA 9.

# FERHENGOK

**A**

Adar: Mart

Agir: Ateş

Agirkuj: İtfaiyeci

Ajel: Hayvan

Ajotin: Sürmek

Alî: Yön

Alîkar: Yardımcı

Alîkarî: Yardım

Alîkariya bilez: İlk yardım

Amade: Hazır

Amade bûn: Hazır olmak, hazır olma

Armanc: Amaç

Asîman: Gökyüzü

Av: Su

Avjenîkirin: Yüzmek

Avjenî: Yüzme

Avmêwe: Meyve suyu

Awa: Şekil

Axaftin: Konuşmak, konuşma

**B**

Bager: Kasırga

Bahoz: Fırtına

Bajar: Şehir

Bakur: Kuzey

Balafir: Uçak

Balkêş: Dikkat çekici

Bapîr: Dede

Bar: Yük

Baran: Yağmur

Başûr: Güney

Bav: Baba

Baxçeyê ajelan: Hayvanat bahçesi

Bazargeh: Alışveriş merkezi

Bejin: Boy

Ber: Ürün

Beran: Koç

Berf: Kar

Berî: Önce

Berma: Artık, kalıntı

Bersiv: Cevap

Beş: Bölüm

Betlane: Tatil

Beyanî baş: Günaydın

Bêdeng: Ünsüz harf

Bêhn: Koku, nefes

Bêhnkirin: Koklamak

Bêhnvedan: Teneffüs

Bêje: Sözcük

Bihar: Bahar

Bihişt: Cennet

Binefşî: Mor

Bingehîn:Temel

Bira:Kardeş

Birin:Götürmek

Birîn:Yara

Birû: Kaş

Biserçûyî:Tarihi geçmiş

Bisiklêt: Bisiklet

Bisk: Zülüf

Bîrkarî: Matematik

Bûn: Olmak

**C**

Carinan: Bazen

Cemidî: Soğuk

Cêwî: İkiz

Cih:Yer

Cil: Elbise

Cotkar: Çiftçi

Ç

Çalakî: Faaliyet, etkinlik

Çapûtê pêçanê: Sargı bezi

Çare: Çözüm

Çarşem: Çarşamba

Çav: Göz

Çavkanî: Kaynak

Çawa: Nasıl

Çend: Kaç

Çep: Sol

Çewt: Yanlış

Çêçik: Civciv

Çêlek: İnek

Çi: Ne

Çima: Niçin

Çira: Işık, lamba

Çirayên hatûçûyê: Trafik ışıkları

Çiriya paşî: Kasım

Çiriya pêşî: Ekim

Çiya: Dağ

Çopdank: Çöp sepeti

Çûk: Kuş

**D**

Dan: Öğün

Dapîr: Nine

Darqîtik: Çelik çomak

Daşir: Tuvalet

Dawî: Son

Dê: Anne

Dêm: Yanak

Dem: Zaman

Demsal: Mevsim

Deng: Ses

Dengdêr: Ünlü harf

Derew: Yalan

Deryaya Spî: Akdeniz

Dest: El

Destpêk: Başlangıç

Destşok: Lavabo

Dev: Ağız

Dever: Yöre

Dew: Ayran

Dêm: Yanak

Dilşa: Neşeli, mutlu

Diran: Diş

Dirêj: Uzun

Dîrok: Tarih

Dîrokî: Tarihi

Dor: Sıra

Du: İki

Duşem: Pazartesi

Dûr: Uzak

**E**

Enî: Alın

Enîşk: Dirsek

Erd: Yer

Erê: Evet

Ewr: Bulut

Ewrî: Bulutlu

Ez: Ben

Ê

Êvar: Akşam

Êzing: Odun

**F**

Ferheng: Sözlük

Ferhengok: Sözlükçe

Firavîn: Öğle yemeği

Firingî: Domates

**G**

Gel: Halk

Gelo: Acaba

Germ: Sıcak

Geştûger: Seyahat

Gilyaz: Kiraz

Giran: Ağır

Goşt: Et

Govend: Halay

Guh: Kulak

Guhdar: Dinleyici

Guhdarîkirin: Dinlemek

Gul: Gül

Gulan: Mayıs

Gund: Köy

Gundî: Köylü

**H**

Hatûçû: Trafik

Havîn: Yaz

Hawar: İmdat

Hefte: Hafta

Henek: Şaka

Hestî: Kemik

Heval: Arkadaş

Hevnasîn: Tanışma

Hewza avjeniyê: Yüzme havuzu

Hezkirin: Sevmek

Hêk:Yumurta

Hêlîn:Yuva

Hênik: Serin

Hêz: Kuvvet, güç

Hinar: Nar

Hingiv: Bal

Hişk: Sert

Hola werzişê: Spor salonu

Huner: Sanat

Hûn: Siz

Hûrbîn: Mikroskop

**Î**

Îlon: Eylül

În: Cuma

Încas: Erik

Îro: Bugün

Îsal: Bu yıl

**J**

Jan: Sızı

Jêbir: Silgi

Jêbirin: Silmek

Jêr: Aşağı

Jêrîn: Aşağıdaki

Jimare: Sayı

Jimartek: Abaküs

Jin: Kadın

Jiyan: Yaşam

Jîjo: Kirpi

Jîngeh: Yaşam alanı

Jîngehparêz: Çevreci

Jîngehparêzî: Çevrecilik

Jor: Yukarı

Jorîn: Yukarıdaki

Jûr: Oda

**K**

Kalek: Kaburga dolması

Kanûna paşî: Ocak

Kanûna pêşî: Aralık

Kar: İş

Keç: Kız

Kelandin: Kaynatmak

Kelûpel: Araç gereç

Ker: Eşek

Kesk: Yeşil

Keştî: Gemi

Kevanî: Ev hanımı

Kevir: Taş

Kevz: Yosun

Kêfxweş: Sevinçli, mutlu

Kêm: Az

Kêzika circirkê: Ağustos böceği

Kin: Kısa

Kiras: Entari

Kirîn: Almak

Kirin: Yapmak

Kîso: Kaplumbağa

Kom: Grup, kulüp

Komelayetî: Sosyal Bilgiler

Komguhêz: Toplu taşıma

Kulîlk: Çiçek

Kur: Oğul

Kurmorî: Karınca

Kurt: Kısa

Kutilk: İçli köfte

Kûr: Derin

**L**

Laş: Beden

Leheng: Kahraman

Lêv: Dudak

Ling: Ayak

Lîstik: Oyun

Lîstikvan: Oyuncu

Lîstikvanî: Oyunculuk

**M**

Malbat: Aile

Malper: Web sitesi

Mam: Amca

Mamik: Bilmece

Mamoste: Öğretmen

Mar: Yılan

Masî: Balık

Mast: Yoğurt

Meh: Ay
Mehîr: Ayran çorbası
Meşk: Yayık
Met: Hala
Mezin: Büyük
Mêr: Erkek
Mêwe: Meyve
Mijang: Kirpik
Mijar: Konu
Mil: Omuz
Mişmiş: Kayısı
Mîkrob: Mikrop
Mîna: Gibi
Mû: Kıl

**N**

Name: Mektup
Nan: Ekmek
Nanpêj: Fırıncı
Nav: Ad
Navber: Ara
Navnîşan: Adres
Neh: Dokuz
Nexşe: Harita
Nexweş: Hasta
Nexweşxane: Hastahane
Neynûk: Tırnak
Nêrîn: Bakmak
Nêzdeng: Yakın sesli
Nêzîk: Yakın
Nivîs: Yazı
Nivîsîn: Yazmak, yazma
Nîsan: Nisan
Nîşane: İşaret
Nîşaneyên hatûçûyê: Trafik işaretleri
Nîv: Yarım
Nîvro: Öğlen
Nûjdar: Doktor

**P**

Pace: Pencere
Paqij: Temiz
Paqijî: Temizlik
Paqijkirin: Temizlemek
Parastin: Savunmak
Parêzer: Avukat
Parza: Aşı
Paş: Arka
Patik: Ense
Payîz: Sonbahar
Pel: Yaprak
Pembû: Pamuk
Peya: Yaya
Peyabor: Yaya geçidi
Peyam: Mesaj
Peyarê : Kaldırım
Peyker: Heykel
Pez: Küçük baş hayvan
Pê: Ayak
Pêjgeh: Mutfak
Pêkenok: Fıkra, gülmece
Pênûs: Kalem
Pênûsdank: Kalemlik
Pêş: Ön
Pêşangeh: Sergi
Pêşî: Önce
Pêwîst: Gerekli
Pêxwarin: Kahvaltılık, katık
Pir: Çok
Pirs: Soru
Pirtûk: Kitap
Pirtûkxane: Kütüphane
Pismam: Amca oğlu
Piştî: Sonra
Pîr: Yaşlı
Pîrozkirin: Kutlamak
Pîroz: Kutlu
Pîrozbahî: Kutlama
Pîşe: Meslek
Pol: Sınıf
Por: Saç
Poz: Burun

**Q**

Qelandin: Kavurmak
Qelî: Kavurma
Qijik: Karga
Qirik: Boğaz
Qîrîn: Bağırmak
Quling: Turna

**R**

Ran: Bacak
Rast: Doğru, sağ
Rastkêş: Cetvel

Razan: Uyumak, uyuma

Rewş: Durum

Rewşa hewayê:
Hava durumu

Rê: Yol

Rêvebir: Yönetici

Rêzik: Kural

Roj: Güneş

Rojane: Günlük

Rojava: Batı

Rojhilat: Doğu

Rojnivîsk: Günlük

Ronî: Aydın, aydınlık

Rû: Yüz

Rûniştek: Sıra

Rûniştin: Oturmak, oturma

Rûvî: Tilki

**S**

Sal: Yıl

Salname: Takvim

Sar: Soğuk

Sayî: Açık hava

Serî: Baş

Serkeftin: Başarmak, başarı

Serma: Soğuk

Serşok: Banyo

Seyrangeh: Piknik alanı

Sêv: Elma

Sibat: Şubat

Sing: Göğüs

Sirûd: Marş

Siruşt: Doğa

Sî: Otuz

Spartek: Ödev

Spas: Teşekkür

Stran: Şarkı

Strîn: Şarkı söylemek

**Ş**

Şagirt: Öğrenci, çırak

Şaneşîn: Balkon

Şano: Tiyatro

Şaş: Yanlış

Şaşî: Yanlışlık

Şeh: Tarak

Şev: Gece

Şilî: Yağış, yağışlı

Şivan: Çoban

Şîr: Süt

Şîrîn: Tatlı

Şîv: Akşam yemeği

Şopandin: Takip etmek,
izlemek

Şor: Tuzlu

**T**

Tamsar: Tatsız

Tarî: Karanlık

Taştê: Kahvaltı

Tax: Mahalle

Taybet: Özel

Taybetî: Özellik

Tebax: Ağustos

Tehl: Acı

Temaşekirin: İzlemek,
seyretmek

Tenduristî: Sağlık

Tenî: İs

Teytok: Seksek oyunu

Tilî: Parmak

Tirî: Üzüm

Tirşik: Güveç

Tişt: Şey

Tîp: Harf

Tîpên girdek: Büyük harfler

Tîpên hûrdek: Küçük harfler

Tîrmeh: Temmuz

To: Kaymak

Toraq: Çökelek

Tû: Dut

Tûj: Acı

**V**

Vala: Boş

Valahî: Boşluk

Veşartok: Saklambaç

Vexwarin: İçmek, içme

Vexurek: İçecek

**W**

Welat: Vatan

Werdek: Ördek

Werziş: Spor

Wesayîtên komguhêz: Toplu
taşıma araçları

Wêne: Resim

**X**

Xaçepirs: Bulmaca

Xal: Dayı

Xaltî: Teyze

Xanî: Ev

Xar: Misket, bilye

Xebatkar: Çalışan

Xeberoşk: Masal

Xetîre: Meşale

Xezal: Ceylan

Xêz: Çizgi

Xêzik: Çizgi

Xiyar: Salatalık

Xizmetkar: Hizmetçi

Xort: Genç, delikanlı

Xox: Şeftali

Xurek: Yiyecek

Xurt: Güçlü

Xwarin: Yemek

Xwe: Kendi

Xwêdan: Terlemek, ter

Xwedîkirin: Beslemek

Xwelî: Kül

Xwendekar: Öğrenci

Xwendin: Okumak

Xweş: Güzel

Xweşav: Hoşaf

Xwê: Tuz

Xwişk: Kız kardeş

**Y**

Yek: Bir

Yeke: Ünite

Yekem: Birinci

Yekşem: Pazar

**Z**

Zanîngeh: Üniversite

Zarok: Çocuk

Zebeş: Karpuz

Zer: Sarı

Zevî: Tarla

Zêde: Fazla

Zêr: Altın

Ziman: Dil

Zivistan: Kış

Zozan: Yayla

Zûgotinok: Tekerleme

# ÇAVKANÎ:


1. Emîr Celadet Bedir Xan&Roger Lescot, Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî), Weşanên Doz, İstanbul: 1991
2. Kadri Yıldırım, Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî Lehçesi), MAÜ Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, Mardin: 2012
3. Mîkaîl Bilbil&Bahoz Baran, Rêzimana Kurmancî, Weşanên Enstîtuya Amedê, Diyarbekir: 2008
4. D.Îzolî, Ferheng: Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî, Weşanên Deng, İstanbul: 2002
5. Zana Farqînî, Ferhenga Kurdî-Tirkî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol: 2005
6. Zana Farqînî, Ferhenga Tirkî-Kurdî, İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, İstanbul: 2000
7. M.Mamîsanij, Mehmed Uzun, J.Îhsan Espar, Ferhengê Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî, Weşanxaneyê Vateyî, Stenbol: 2009
8. Grûba Xebate ya Vateyî, Rastnûştişê Kirmanckî(Zazakî), Stenbol: 2005
9. Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Mesele û Metelokên Gelê Kurd, Enstîtûta Kurdzaniyê, Wien: 2005
10. Kovara Hawar (1932-1945), Weşanên Nûdem, Stockholm: 1998
11. Kovara Ronahî (1942-1945), Kombenda Kawa Bo çanda Kurdî, Erbîl: 2001
12. Xwendina Kurdî Bo Pola Sisêya Bineretî, Hewlêr: 2008
13. Ramazan Pertev, Zarok û Çîrok (Destpêka Pedagojiya Kurdî), Weşanên Doz, Stenbol: 2008
14. Emîn Ebdulqadir, Hozan û Şanogeriya Zarokan di Edebî Kurdî de, Weşanxaneya Spîrêz, Hewlêr: 2007
15. Kovara Kepîr, Duhok: 2010
16. Zeynelabîdîn Zinar, Xwençe, Stocholm: 1989-1993
17. Mehmûd Lewendî, Kovara Hêlîn, Stocholm: 1996
18. Heciyê Cindî&Emînê Evdal, Folklora Kurmanca, Weşanên Avesta, Stenbol: 2008